

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

*Xebat ji bo* :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar (111)* *Sal 20 Pûşber 2015z - 2627k* *Buha (50)L.S*


# Rêz û Rûmet ji Şehîdan re
# Serxwaşî û Aramî ji Gelê Kurd re

## Desteya sernivîser

**L**i kat pênc, li danê sibê ji roja 25an ji meha Pûşberê, dîsa çeteyên Rêxistina Dewleta Îslamî (Daiş) hêrişke hovane birin ser bajarê Kobanê.

Li gora çavkaniyan, derdora sed çeteyên Daişê ku alên Artêşa Azad û YPG rakiri bûn, li gel çekên xwe û bi makînan derbase nava bajarê Kobanê bûn û yekser dest bi kuştina sivîlan kirin.

Pişt re, wan komên kuştaran di nava çend avahiyên bajêr de çeper girtin û dest bi segmankirina[qens] her kesê ku li kolanan dilivî kirin.

Şer û pevçûnan di navbera şervanên Kurd û komên çeteyan de dora sê rojan dirêj kir û di encamê de piraniya terorîstan hatin kuştin û hejmarek jî dîl hate girtin.Li gora serhejmara fermî ya ji hêla YPG ku li roja 30î ji Pûşberê hati bû belavkirin, di encama hêrişa terorîstan de, 233 kes ji şêniyê bajarê Kobanê û gundên derdora wê hati bûn şehîdkirin, 273 kes birîndar bû bûn û 35 şervanên Kurd jî jiyana xwe ji dest dabûn û bû bûn şehîd . ………………... 2



" Wêneyek ji komkujiya Kobaniyê "

## Bîranîna 58mîn a damezrandina Partî Demoqratî Kurd li Sûryê



**B**i boneya salvegera 58an a demezrandina Partiya Demoqrat a Kurd li Sûryê, Partiya Yekîtî ya Demkrat a Kurd Li Sûryê (YEKÎTÎ) li gelek navendên xwe li herêma Çiyayê Kurmênc (Efrîn) komcivîn li dar xistin û bone tê de bi bîr anî. Gelek hevalên xebatkar ên navsal û hevalên partiya Yekîtî lê amade bûn. Di rûniştinan de, berpirsyarên Partiya Yekîtî li ser merc û nîrên ku partiya Yekem tê hati bû damezrandin axivîn û li ser rastiya hebûna gelê Kurd û mafên wî yên rewa li Sûryê hate axaftin. Hevalên berpirsyar bi dirêjî li ser yekbûna tevgera niştimanî ya Kurd li Sûryê axivîn û nêrînên partiya Yekîtî şirovekirin. Hejmarek ji xebatkarên navsal mîna mamoste Mihemed Enwer jî li navenda bajarê Efrînê beşdar bûn û çend gotinên hêja li ser xebata salên destpêkê kirin.*

# Talan û Enfalkirin Ne Ji Çanda Kurda Ne

▪ M. Elî

Her dema ku hêzên şervanên Kurd YPG û YPJ di şerê li dijî terorîstên Rêxistina Dewleta Îslamî (DA`IŞ) de bi ser dikevin, navçeyên kurdî û axa Sûryê jî ji hovîtiya wan pak dikin, dengên çavteng û zikreşan ji rikbera Sûrî bilind dibe, û hewil didin ku navûdengê lehengên Kurd û berevaniya wan ji ber tevahiya gelê Sûrî ve reş bikin, û wan bi goçkirina hemwelatiyên Tirkmen û Ereb û talankirina malên wan tewanbar bikin.

Mebesta wan ji wê tewana derewîn, ne tenê reşkirina navê hêzên kurdî ye, armanca wan ya rastî di paş de veşartiye, ew jî tunekirina mafê gelê Kurd li Sûryê ye. Ji bilî wê mebestê, di paş wê helwesta (da`işhez) de tewkirin erêkirin ji siyaseta Tirkiyê re li derbarê Kurdan û razîkirina wê jî heye.






Eger nofek ji hêzên rikberê dixwaze ji hêza DA`IŞ xelas bibe, lê dilxwaziya sereke û bingehîn a destlata Tirkiyê ew e, ku ji doza gelê Kurd bi tevahî, û ji sîstema PKK-PYD bi taybetî xelas bibe.

Deh caran serokomarê Tirkiyê Rêzdar Receb. T. Ardogan aşkere gotiye, ku ((PYD jî mîna Dai`şê têrorîst e)), yanê tevgera azadîxwaz a Kurd û Rêxistina Dewleta Îslamî bi heman terezûyê dipîve û hemtayî hev dike. Ew dixwaze Yekîtiya Wîlayetên Emerîka û Yekîtiya Ewrupa jî bi wê yekê bawer bibin, helwesta Tirkiyê qebûl bikin, daku piştgiriya xwe ji Kurdan bibirin.

Yanê mirov bê dudilî kane bêje, ku jêdera pirsa (têrorkirina) hêzên kurdî û tewatîra (goçkirin û talankirina) wan ji Ereban re, ji bingeha xwe de ji Anqere dertê û beşin ji Iitîlafa Niştimanî ya Sûrî jî li wê têlê dixwe û dixwaze wan vir û fûtan piştrast bike. Eger rastî ne wilo ye, çima ji nava hemî hêzên rikberê tenê ew tewana derewîn a li dijî hêzên kurdî tenê ji hin aliyên Iitîlafê ya ku li Istembûlê dimînin dertê?.

Bûne nod û pênc sal ku ..... ⓫

## Rêz û Rûmet… Dûmahîk

Bi vê komkujiya mezin û hovane, careke din Kobaniya birîndar qelengê kurdîtiya xwe da, vê carê jî ji ber rizgarkirina navça Girê Sipî de xwîna mirovên wê hat rijandin. Xuya bû, ku ew serkeftina mezin û giranbuha di çavên nijadperestan de hilnehat, nemaze jî ((Cîranên me yên Bakur)). Ji ber ku ew hîn siyaseta xwe ya ji sedsalan de di tenga gelê Kurd re dajon û naxwazin bawer bikin ku cîhan ji binî de hatiye guhertin û gelê Kurd jî mîna hemî gelên cîhanê divê bigihê mafên xwe û bi şêwakî azad û aştiyane li ser xaka bav û bapîrên xwe bijî.

Roja îro, tevaya raya cîhanê dibîne ku çawa lawên gelê Kurd bi qehremaniyeke mezin li dijî terorê şer dikin. Xebata wan pir bi bilindî tê nirxandin. Tenê rayedarên cîranê me ji Tirk û Ereban li bervajî zagonên jiyanê û mafên gelan radiwestin.

Çawa mirov kane ewqasê bextê xwe reş bike û terora terorîstên Daişê bide ber xebata şervanên gelê Kurd.

Bêguman, ev siyaseteke pir çewt e. Êdî tu kes wê siyasetê ji rayedarên Tirkiyê û ji bilî wan jî napejrîne. Ji ber ku ew siyaseta li tersî hemî danezan û zagonên civaka navnetewî ye û li dervayî dîroka nûjen a mirovatiyê ye jî.

Nemirî ji pakrewanan re. Aramî ji gelê Kurd re. Bila serê Kobaniya me ya qehreman xweş be.*

# Pirsgirêka Sûriyê... Girêka kor!



" Girêka Sûriyê ya kor …. Malwêrankirin e - Heleb "

▪ **R. Silîvî**

Ev e bêtir ji çar salan e ku şoreşa Sûriyê ya aştiyane vêketiye, di gelek merc û qonaxan re derbas bûye, rê û rêçik jê derketine, toşî gelek pîlan, dek û dolabên neyarên gelê Sûriyê bûye û di encamê de, dora çarêkek milyon welatî hatine kuştin, bi sed hizaran seqet û birîndar ketine, herweha, bêtir ji/12/ milyon mirov ji cih û warên xwe bar kirine, penaber bûne...Ango, bi kurtî mirov dikare bibêje ku agir bi welêt ketiye, hawîr xwîn, kuştin, talan û wêran e!.

Bêgomane ku rijêma Sûriyê ya dest bi xwîn gunehê sereke yê vê tewana bê mînak hiltîne, û darizandina wê ustubarê rêxistinên navnetewî ye. Lê belê, di pileya duwem de jî, civaka navnetewî di ber de berpirsiyar e. Ew dewletên xwedî rol û biryar li kêleka hin dewletên deverê, ku ji bo bidestxistina hin berjewendiyên xwe, bi şêweyekî ji şêweyan, destêwerdan di vê pirsê de kirine, bi xurtî pif li agirê vî şerî kirine, geştir û gurtir kirine, îro ew ter û hişk dide ber xwe, dişewitîne, ji xakeke rût, reş û wêran pêve, tiştekî li şûn xwe nahêle!.

Ji ber gelek sedeman, mîna derengketina dîtina çareyeke siyasî ji pirsgirêka Sûriyê re, di wan her çar salên borî de, her çûye, rêjeya tund û tûjiyê bilnd bûye, zimanê diyalog û hişmendiyê li paş maye, yê teqîn û barûdê serdest bûye, hêzên tariyê yên terorist mina (El Qayide û Daişê) ji bal bazirganên şer ên cîhanê û xêrnexwazên gelên Sûriyê ve bi hezaran hatine şandin, ku tevliheviyeke mezin di rewş û paşeroja Sûriyê de peyda kirine. Ev ji hêlekê ve. Ji hêleke din ve jî, mixabin ku piraniya partiyên rikbera Sûriyê ji hev bela ne, ew di du çarçewan de kom ser hev bûne, û wan tu program û rêbaza xebatê destnîşan nekirine. Ne tenê wilo, rikberiyê xweseriya biryara xwe winda kiriye û ew di bin bandora dewletên ku alîkariya wê dikin de dijî, li gora berjewndiyên wan dewletan, ne li gora xwestek û berjewendiyên gelên Sûriyê tevdigere. Li hember vê rastiyê, gel jî baweriya xwe bi wilo rikberî winda kiriye. Ji ber van sedeman û gelekên din jî, "Girêka Kor" li pirsa Sûriyê ketiye, çiku kilîtên çareseriyê ne destê rijêmê, ne jî di destê rikberiyê de ne, û biryar, biryara wan dewletên mezin e, ewên ku di nîgarkirina siyaseta navnetewî de xwediyên rolên serke ne, û sed mixabin ku hêviyên lihevkirina wan dewletên mezin ji bo dîtina çareyeke siyasî di demeke nêzîk de ne diyar e!.

Ev terora reş a ku bi fermana navend û hêzên dijî gelê Kurd û hêviyên wî di jiyaneke serbest, azad û aştiyane de, berê xwe dane deverên Kurdî çi li başûr û çi li Rojavayê Kurdistanê, mebest jê ew e, ku çavê gelê Kurd bişkînin û vîna wî ya azadîxwaz birûxînin. Lê belê, berxwedan û lehengiya ………...

4

Nêrîna Azad

# Ne ji dîroknasan re

Memê alan

Weke em dizanin siyasetên şoven û nijadperest ji aliyê rijîmên setemkar ên ku hatine ser destlata Sûriyê li dirêjiya dehsalan li dijî gelê me yê Kurd li Rojavayê Kurdistanê, hîşt ku hinek rewşenbîr û ronakbîrên gelê me yê Kurd ên dilsoz li şêwe û riyên berxwedanê li hember wan pêlan û siyasetên kirêt ku di dermafê jiholêrakirina gelê me de tên meşandin, bigerin .Di encama lêgerîna xwe de di 14/ 6/ 1957 an de, rêxistina civakê rêrast dîtin û Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (El-Partî) bi piştgiriya Partiya Demokrat a Kurdistanê li Kurdistana başûr damezrandin .

Armanca damezrandina "El-Partî", hilanîna zor û zordariyan li ser gelê me yê Kurd li Rojavayê Kurdistanê û pêkanîna mafên netewî yên rewa bû.

Ji wê hîngê ve, xebata me ya Kurd li Sûriyê durvekî rêxistinî stand, rola "El-Partî" ji bo belavkirina hişweriya niştimanî û netewî di nav Kurdan de bi bandor bû, û kanî camewerekî fere û ji hemî qatên civaka Kurd li Sûriyê li dor xwe bicivanda .Lê xebata "El-Partî" çavên rijîma Sûriyê ya şoven wê hîngê êşand û tirsand ,wê lomê gelek serkirdeyên wê girtin û xistin zîndanan.

Ji wê û pêve, nakokiyên rêxistinî, rêzanî û ezîtiya kesayetî û perçebûnan dest pê kir û ta roja îro jî berdewam e û her car jî hin sedem diyar in û hin jî veşiartî dimînin. Emê li gor dîtin û zanîna xwe wan sedeman bi giştî ji xwendevanan re diyar bikim:

1-Serkirdeyên Kurdan nikanîn ji çanda mirovê bindest û perîşan -ew mirovê tim xwe jar û lawaz dibîne û nikane kesayetiyeke serbixwe û bi tenê ………....⓫

### Pirsgirêka …. Dûmahîk

şervanên Kurd çi Hêzên Pêşmerge, çi jî Yekîniyên Parastina Gel û Parastina Jinê, bi piştevaniya gelê me yê dilsoz û hêzên asîmanî yên Hevpeymana Navdewletî, hêzên terorê di eniyên şer de çi li Başûr, çi jî li Kobanê, Serê Kaniyê, Girê Sipê û Ên Îsa yê şikestin, bi sedan kelaşên şervanên xwe li şûn xwe hiştin û ber bi Tirkiyê û parêzgeha Reqayê ve reviyan. Bi van serkeftinên leşkerî, ji cîhanê re bi zelalî hate diyarkirin ku Kurd dikarin terorê bibezînin û wê ji welatê xwe dûr bêxin.

Xuya ye ku berê devera me li guhertin û rewşeke dîrokî ye, û wekî ji me hemiyan ve diyar e, tu rêz û rûmet ji sivîl, qels û belengazan re di civaka navnetewî de tune ye. Herweha em dizanin ku hêz û hinera me weke gel, di yekîtî, rêkeftin û hevgirtina me de ye. Eger hêz û partiyên me yên Kurdî mil li mil bi hev re bibin yek, wê demê, yekser deng û hêza gel jî dibe yek…Hîngê, dost û neyar, biçûk û mezin dê neçar bimînin rêzê li gelê Kurd bigrin û li rewatiya mafên wî yên netewî mikur werin, û dê mîna hemû gelên cîhanê di welatê xwe de bextewer û azad bijî.

Eger em rêzê ji xwîn û giyanê pakrewanên Kurdistanê re bigirin. Eger bi rastî, em xwe neviyên Mîdî, Mîtan, Hitît û Horiyan bibînin, eger bi rastî em xwe neviyên Ehmedê Xanî, Cizîrî, Bedirxaniyan, Seyid Riza, Seîd Pîran, Cibrî Begê, pêşewa Qazî Mihemed û Barzaniyê nemir bibînin, xwe di ber şop û armancên wan de berpirs bibînin, pêwiste em berjewendiyên xwe yên partîtî û kesayetî yên biçûk li hêlekê deynin, bi biratî, hişmendî û dilsozî dest bidin hev û berê xwe bidin neyarên doza gelê xwe. Herweha divê em zanibin ku çanda berberî û zikreşiyê ne ji çanda gelê me yê Kurd e, lê belê, ew yek ji derd û nexeşiyên me yên herî mezin e ku ji mêj ve, neyarên hebûna gelê me li dirêjahiya sedê salan di hiş û derûna me de çandine, bi demê re, her nifşekî daye nifşekî ta gihaye roja me ya îro, dermanê wê jî zanîn e.

Em bawer in ku çawa hêzên teror û tariyê li ser destê Kurdan taromar dibin, ev nexweşî jî dê li ser destê keç û lawên me yên jîr û xwendevan dê taromar bibe, civaka me saxlem û hevgirtî bibe, û her emê xebata xwe ya aştiyane ji bo jiyaneke geş, ji bo wekhevî û hevrejiyana hemû gel, netew û olan berdewam bikin.

# Rastiya Xebata Kurdî Û Pirsine Rewa

▪ Merwan Merekat

Di destpêka şoreşa azadî û rûmetê ya aştiyane ku li ser destê zarokên Der`ayê di 15. 03. 2011an de çîk da, cemawerê Kurd û tevgera Kurdî ya rêzanî li Sûriyê biryar dan, ku ew beşek ji şoreşê ne, û li seranserî herêmên Kurdî xwepêşandanên aştiyane bi armanca rûxandina rêjîma El Be`s hatin kirin. Siloganên ku di kolana kurdî de dihatin bilindkirin tam diketin xizmeta şoreşê, û piraniya wan ne cudayî yên bajarên Der`a, Şam, Hema û herêmên Sûriyê yên din bûn, wek: *Rûxandina rêjîma El Be`s, Sûriyeke nû bi hevpariya hemî pêkatiyên wê, û Şoreşa me şoreşeke aştiyane ye…* H.W.D. Lê durişmên balkêş û yên ku gel û tevgera rêzanî ya Kurd bi wan bawer in, mîna: *Kurd û Ereb bira ne. Yek e.. yek e, gelê Sûrî yek e,* ew pirtir dihate bilindkirin. ***Ma gelo yek ji aliyê rikberiyê hebû, ku wan jî li herêmên Erebî silogana (Ereb û Kurd bira ne) bilind kirin***?? Ev pirs di destpêka şoreşê de dihate kirin, û bersiv nehate dayîn. Ne tenê wisa, lê belê di destpêka şoreşê de, û ta roja îro jî, pir alî û hin kesên ku xwe ji rikberiyê nîşan didin, wan bi tundî şerê partiyên Kurdî dikirin, û dixwestin cemawerê Kurd jî dest ji tevgera xwe ya konevanî berde û di bin sîwana siloganên wan ên ku ne tenê mafê Kurd, lê belê ta birati-ya Kurdan jî napejirînin, bimeşin. ***Ma gelo mebesta wan çi bû, û dixwestin berê gelê Kurd bi kû de bidin***??

Zarokên Der`ayê Hemze El Xetîb û hevalên wî, ku di bin destên karbidestên rêjîmê de, ku ji lêdanê hatibûn şehîdkirin, yek rojnama partiyên Kurdî tunebû, ku wêneya wan dernexistin, û ew kiryara hovane şermezar nekirin. Û di xwepêşandanên ku li herêmên Kurdî dihatin kirin, silogana *Hemze El Xetîb û hevalên wî pakrewanên me ne* dihate bilindkirin. *Ma gelo ev netê wateya ku gel û tevgera Kurdî hemû pêkhateyên Sûriyê wek hev dibîne, û tu cudatiyê naxîne navbera wan?* Di mehên pêşîn de ji temenê şoreşê û ta roja îro bi hezaran ji Kurdan û endamên partiyên Kurdî şehîd bûn, çi bi destê rêjîmê, û çi jî bi destê hin aliyên tundrew. ***Ji bilî çend pakrewanan, çima aliyên rikberê jî wek Kurdan ew nekirin pakrewanên şoreşê***? Ji wê xerabtir, ***ji bo çi û armanca wan çi bû, bûyera şehîdbûna wan dixistin stiwê hin aliyên Kurdî***??? Zor mixabin hîn jî hewildanên wisa ji aliyê piraniya rikberê ve berdewam in.

Rêjîma El Be`s a şûven û nijadperest di hemû belgenameyên xwe de nîşan dide, ku Kurdên li Sûriyê koçber in. Ango Kurd ne xwedî xaknîgar in. Û di pir belgenameyan de jî dibeje: Li Sûriyê Kurd nînin!!? Bêguman ev



" Jinên Kobaniyê berevaniyê dikin "

zihniyeteke şovenperest û regezperst e. Li aliyê piraniya rikberê, û Hemahengiya Sûrî jî di nav wê de, ta roja îro nikarin Kurdan wek milet bipejirînin. Dema têrma (Rojavayê Kurdistanê ) tê bilêvkirin strî di çavên wan de tên daçikandin. ***Ma gelo çi cudatî di navbera herdu mejiyan de heye??***

Dema ku berê şoreşê dane çekdariyê û ew li heza rêjîmê û hin dewletên herêmê jî hat, ji ber ku wê rê li pêş rêjîmê zêdetir vekir, ku hemû çekên xwe bi kar wîne û bi kîndariyeke pirtir hemû deverên ku tevlî şoreşê bûne bombebaran bike. Ew li heza hin dewletan jî hat, ji ber ku çekdarbûna şoreşê hîşt deriyine pirtir ji destêwerdanê re vebin, û bi wê destêwerdanê belkî karibin hin berjewendî û armancên xwe yên taybet di herêmê û li derveyê herêmê jî bi cî bikin. Di destpêka çekdariya şoreşê de, tevgera rêzanî ya Kurdî nêrîna xwe diyar kir û got: Berê şoreşê hate guhartin. Sûriyê ji şoreşê derbasî derbasî ......... 6

**Rastiya Xebata … Dûmahîk**

kirîzeke dirêj bû, û ev yek dê bêle ku temenê rêjîmê dirêj bibe, demê jî teqez kir, ku ew nêrîneke rast bû.

Piştî ku tevliheviya çekdariyê li serûberê Sûriyê çêbû, Kurd jî neçar bûn, ku herêmên xwe biparêzin, ji ber wê jî Yekîneyên Parastina Gel wek hêzeke Kurdî hate dameziradin. Di vir de pirsa mezin ew e, hemû aliyên rikberê çekdariya xwe rewa dîtin, û tevan piştgiriya wan hêzên ku her bêlûkek bi dewleteke dervî sînorê Sûriyê ve girêdayî ye kirin, û serê xwe bi wan bilind dikin, belkî ew ji mafê wan be, ***lê çima dema Kurdan ji bo xweparastinê hêza xwe ragihand çav li wan sor bûn, û ta niha jî şerê vê hêza rewa dikin??***

Piraniya wan hêzên çekdar ên ku rikberiyê piştgiriya wan dikirin, û belkî hîn jî, bi dizî dikin, ew bûne yek û nav li xwe kirin Rêxistina Dewleta Îslamî (Da`iş). Ji dêvlî ku ew şerê rêjîmê bikin, wan Kurd ji xwe re kirin armanc û bi hemû kiryarên xwe yên terorîst û hovane êrêş birin ser herêmên Kurdan, û talankirina Kurdan ji xwe re erkekî olî û rewa dîtin. Van çeteyên tundrew û terorîst bi mehan bajarê Kobanê bi hemû çekên giran topbaran kirin, û hemû niştecihên bajar û gundên Kobanê li dervî sînor bûne penaber. Di dirêjiya şerê Kobanê de, zimanê rikberiyê û di nav de yê Hemahengiya Sûrî jî, lal bû, berçavkên wan tarî bûn û guhên wan jî ker bûn, ne bûyer didîtin, û ne jî hawar dibîstin. Belkî di bin re li heza wan jî dihat, ku Kurd ji herêmên xwe derkevin û paçereş tê de cî bigrin. Di wê navberê de, hêzên Yekîneyên Parastina Gel Y.P.G - Y.P.J berxwedaneke dîrokî û bê hemapa dikirin. Dema ji aliyê perlemana Herêma Kurdistanê ve biryar hate dayîn ku Pêşmergeyên qehreman derbasî Kobanê bibin û piştgiriya birayên xwe bikin, serûberê rikbera Sûrî, zimanê wan ji lalbûnê rizgar bû, û şerê wê piştgiriyê kirin. Ango ta hevkariya Kurdan jî, li zora wan tê, û wan çavsor dike. ***Ma gelo ta kîjan astê rikberiyeke wisa dê cihê baweriya gelê Kurd be???***

Dema ku hevbendiya navdewletî bi hêza wê ya ezmanî alîkariya hêzên Kurdî kirin, û navendên Da`işê bombebaran kirin, qêrîn bi piraniya aliyên rikberiyê ket, û nerazibûna xwe nîşan kirin. ***Ma gelo ew hêvîdar bûn, ku Kurd qir bibin***?? Piştî ku çiyayê Kizwanan ji hovên serdema bîst û yekê hate rizgarkirin, û zexta terorîstan ji ser gundên Aşûrî û Kurdan kêm bû, hemû ekranên qenalên ku bi ser rikberiyê ve ne, netebitîn, û her yekê li gor asta kîndariya xwe ji Kurdan re şerê wê serkeftinê kirin. ***Çima her ku hêza Kurdî li eniyên şer li hember mejîtariyên Da`iş bi ser dikeve, çavên rikberiyê teng dibin, zimanê wan tûj dibe û bi tundî şerê wê dikin***??

Di miha Pûşberê de hêzên Kurdî Girê Sipî ji terorîst û tundrewên reş baqij kirin, û bi wê serkeftinê riyek ji riyên locistîk ji ser çeteyên Da`iş hate birîn, û rê di navbera hin herêmên Kurdî de vebû. Vê serkeftinê serûberê rikberiya Sûrî û nemaze ya ku di seyrangeha Stenbolê de bi cîwar bûye, çav li wan sor bûn, û bê dudilî Kurd tewanbar kirin. Ne tenê wisa, lê belê hinan hêzên Kurdî bi terorîstiyê bi nav kirin. Ango bi derew û kîndariya xwe dixwestin yekê li ser Kurdan bigrin. ***Ma gelo dema ku rêjîma El Be`s pirojeyên xwe yên şoven li ser Kurdan cîbecî dikirin, gund û erdên bav û kalan ji Kurdan distandin û didane Ereban, ev kesên ku îro xwe di refê rikberiyê de dibînin, û bi tundî şerê Kurdan dikin, ew li kû dixebitîn***? ***Ma ne piraniya wan di nav rêjîmê de li ser kursiyên biryarstandinê bûn***?? Di van çar salên borî de, tevgera Kurdî ya rêzanî li Sûriyê gelek pirojeyên lihevkirin û yekrêziya navxweyî pêşkêş kirin, û hin ji wan bi serketin wek Encûmena Niştimanî ya Kurdî, lê mixabin hin aliyên Kurdî yên di nav Encûmena Niştimanî ya Sûrî, ………… 10

# Divêt HDP Xwedîtiyê Li Dengê Miletê Kurd Bike

**Arif Zêrevan**

KURDISTAN, 20/6 2015 — Di hilbijartinên heftê hezîranê de miletê kurd li bakurê Kurdistanê bi zêdetirî şeş milyon dengan barekê giran li partiya HDP-ê ya bi serokatiya Selahattin Demirtaş kir. HDP bi dengên kurdan bi ser ket û AK Partî jî bi dengên kurdan xusirî.

HDP-ê di hilbijartinên sala 2014-ê de 2 milyon û 746 hezar deng standin. Di hilbijaritnên vê carê de zêdetirî şeş milyonan (6 058 489 deng ko dike ji % 13.12 yê temamiya dengên Tirkiyeyê û bakurê Kurdistanê) deng standin.

HDP-ê li bajarên wekî Diyarbekir, Şirnex, Wan, Mêrdîn, Mûş, Bitlîs, Dêrsim, Hekarî û hinek bajarên dî yên bakurê Kurdistanê derbeyeka mezin li AK Partiyê da û li bajarên wekî Urfa û Entabê jî dengên xwe duqat kir û li Urfayê nêzîkî ji % 40-ê dengan stand.

Li Stenbolê jî HDP-ê zêdetirî milyonek dengên kurdan stand û li Îzmîrê jî hêza hebûna xwe nîşan da. Hinek çepên tirkan îdia dikin ko HDP-ê "dengên emanet" ji CHP-ê standine lê belê lêkolîneka şirketa Kondayê aşkera dike ko HDP-ê dengên xwe ji AK Partiyê standine û li cihên ko CHP lê xurt e deng ji HDP-ê re neçûne.

AK Partî bi nisbeta neh prosentan daketiye û dengên wê ji HDP-ê û MHP-ê re çûne. Kurdên di nêv AK Partiyê de ji Erdogan aciz bûn û dengê xwe dan HDP-ê û tirkên nijadperest yên di nêv AK Partiyê de jî dengê xwe dan MHP-ê.

Netîceyên van hilbijartinan nîşan didin ko hêdî kurd ji bilî Entab, Mereş, Urfa, Meletya, Elezîz û hinek bajarên li ser tixûbê Tirkiyeyê dengên xwe nadin partiyên tirkan û HDP-ê digel hemî siyaseta wê ya "tirkiyecî" wekî partiya xwe dihesibînin û dengê xwe didin partiyeka "kurdan".

Ev netîce nîşan didin ko ruhê neteweyî yê miletê kurd hêjî li bakurê Kurdistanê zindî ye û heger heta çar salên dî HDP siyaseteka meqûl bimeşîne ne dûr e ko HDP li Entab, Urfa, Mereş, Meletya û cihên dî jî bikare dengên kurdan bi aliyê xwe ve bîne û kurdan bi temamî ji tirkan veqetîne.

Wekî netîce em dikarin bibêjin:

1. HDP-ê bi dengên kurdan baraja ji % 10-ê derbas kir û ev ji bo cidabûna miletê kurd ji miletê tirk baş e.

2. Herçend serkirdeyên HDP-ê behsa "tirkiyecîtiyê" bikin jî kurd hêdî-hêdî xwe didin ser hev û di nêv tixûbên siyasî yên Tirkiyeyê de be jî kurd dixwazin hêza wan yek be da bikarin tesîrê li ser siyaseta dewletê bikin.

3. Heger di hilbijatinên cara bêt de kurdên Entab, Meletya, Mereş, Urfa, Elezîz û cihên dî jî dengên xwe bidin HDP-ê yan partiyên dî yên kurdan hingê hêza bloka kurdî dikare bibe ji % 25-ê hemî dengên Tirkiyeyê û zêdetirî 140 parlamenteran bi dest bixe.

4. Dema ko hemî dengên kurdan li cem HDP-ê yan partiyên dî yên kurdan kom bibin hêdî hîç partiyeka Tirkiyeyê nikare bêyî kurdan hikûmetê ava bike. Partiyên tirkan ji aliyê hejmara dengan û parlamenteran ve bikarin bi hev re hikûmeteka koalîsyonê ava bikin jî mecbûr in digel HDP-ê koalîsyonê ava bikin ji ber meşrûiyeta hikûmetê namîne. Hikûmeteka bêyî şirîkatiya kurdan li Tirkiyeyê dê hikûmeteka ne meşrû be.

5. Hikûmeteka koalîsyonê li Tirkiyeyê firsetên nû dide başûrê Kurdistanê jî.

Tirkiyeya bi serokatiya Erdogan gehiştibû qunaxekê ko hêdî reform nedikir û Erdogan di têkiliyên xwe yên digel Kurdistanê û miletê kurd de jî "quretiyeka" ji xwe zêde dikir. Hikûmeteka lawaz ya koalîsyonê dikare firsetên nû bide başûrê Kurdistanê jî û îmkanên danûstenadineka wekhev zêdetir bike.

Vêca mesele hemî ew e ka HDP dê çiqasê bikare xwedîtiyê li şeş milyon dengên miletê kurd bike û li gor wê yekê mafên miletê kurd li bakurê Kurdistanê biparêze û têkiliyên xwe digel başûrê Kurdistanê jî xweş bike.

**** Ji malpera: nefel.net.***

# Axaftin Bi Efrînê Re

Fidan Abdalo



Çiyayê Kurmênc – Efrîn, herêma Efrînê, bi şûnewar û diyardeyên dîrokî, bi darên zeytûn û hinaran, û bi cureyên çandiniyê, bi çiyayên bilind, bi sirûşta rengîn û bi xelkê xwe yê sincîpak û bedew naskirî ye.

- Dem baş Efrîna min. (Min silav da, wê jî wiha vegerand û em axivîn):

-Dem baş (Efrînê bi dilekî xemgîn û dilsarî li min vegerand).

-Efrîna min ez li te mêze dikim tu pir xemgîn û melûlî.

- Ax.. Ax.. erê çawa ne bi xem û êş bim. Te birîna min vekir lê!! Miletê min li derdora min nema, ez bûm wek dareke rût bê pel û ber, wek dibêjin:Dar bi berê xwe û bajar bi miletê xwe.

- Na!! Na!! Dinya hîn di xêr û xwaşiyê de ye.

- Çawa bi xêr e?

- Belê xelkên te li ser axa te dijîn, û bi hemû şêweyan berevaniya te dikin.

- Ger rewş wiha be ew xelkên mane jî wê berê xwe bidine biyaniyê.

- Tu çi dibêjî? Efrîn!! Tu qet ji bîr nabî. Tu di dilê her mirovekî Efrînî de gelek biha û nirxdar î.

- Gelo ev milet ku li ser axa min jiyaye, û bi xêr û bêrên min mezin bûn, îro di van rojên dijwar de li rex min ranawestin û berê xwe dane xerîbiyê.

Efrîn! Xerîbî gelek dijwar e, ax, deşt û çiyayên te qet ji bîr nabin.

- Belê belê... Wê min ji bîr bikin, ger mezin min ji bîr nekin, zarok wê min ji bîr bikin.

- Efrînê!!! Ji bîr meke, ku çiqas stiran û gotinên xwaş li ser te hatine gotin, û gelek pirtûk li ser te hatine nivîsandin.

- Erê!! Wê demê ez ne di tengiyê de bûm, lê niha ez ji her aliyekî ve dorpêçkirî me.

- Ne tu tenê ji miletên xwe vala dibî, mêzeke li bajarên Kurdan ên din wek Qamîşlo û Kobanê......

- Loman ji kobanê nakim, ji ber ku xişm û bêtar bi ser de hat.

- Efrîn! Ger rewş wiha be emê bi aramî rewşa xwe berdewam bikin.

- Roj bi roj rewş berve xerabûnê diçe, win dibînin niha ez ji hemû aliyan de dorpêçkirî me, rewş zor dijwar e.

- Bêguman, çarek ji vê rewşê re dê were danîn, tenê ji miletê te tê xwestin ku bi aramî û bêhneke fere jiyanê berdewam bike. rewşa te li gora bajarên din baş e û li ser hev e, em jî hîn li ser xwe ne, em Efrîna xwe diparêzin û jiyaneke aştiyane derbas dikin..... Bila tu piştrast bî Efrîna me. Eger YEKBÛN û LIHEVKIRIN hebin, birçîbûn û dorpêçkirin bi me nikare, û qet vîna xelkê te qels nabe.

# ODEYA GUNEHKARIYÊ

Kurteçîrok

Merwan Berekat

Sê dîwarên odê bêdeng bûn, yek jî, ji wêneyê zordarekî nijadperest dinalî, û ji nalîna wî banê odê tîk bibû…???

Di koşeyeke konikgirtî de, maseke kenarşikestî hawar dikir, û li ser masê pênûseke rengreş û zimantazî li benda nivîsandina hin çîrokên derewîn bû.

Li pişt masê kursiyeke bêbext û gunehkar çep û rast dizêvirî. ji giraniya laşê ew bênîhadê ku li ser kursiyê rûniştibû, zîrkezîrka kursiyê vedenga zikreşiyê dida û wêneya bi dîwêr ve devqîç dikir.

Deriyê odê ne kilîtkirî bû. Lê navnîşana li ser wî qafek û du hestî bûn..???

Ji nişkê ve, agir bi lênûskê ket, dûmaneke reş ji wê derket, û wêneya bi dîwêr ve, zêde reş kir…!!!!??

Pênûsê pirs kir: Çi çêbû? Çi heye??

Lênûsê bersiv da û got: Berî katjimêrekê te navê nokerekî li rûpeleke min nûsand, û te biryara zindankirina azadîxwezekî da. Ez bi agirê xeydê dişewitim.

Pilindirekî digel konikê xwe, ji qozîka odê ya li pişt masê, xwe avêt nav êgir, lênûsê pirs kir: Tu çima xwe davêjî nav êgir??

Got: Belkî terafa wî bilind bibe û wêneya bi dîwêr ve bişewitîne.

## KOBANÊ

**Merwa Birîm**

Wesêka Arînê bû
ku di nav lêvên
qorşînan de jî
tu bikenî
Birûskên çavşil
li kolanèn lehengiyê
serî hildane
Rabe ser milên xwe
bûkan bi tivingan
çav kildane
Nêynûkên
bi xwînê tîmar
bûne
ko nabin
kobanê
ko nabin






## EZ BÛM ŞIVAN

**Vejîna Kurd**

Li ser…
danıştekeke westiyayî
rûniştime
û li serê…
roj û şevên seqagirtî
mêze dikim
Hevdeyên…
porê demê dijmêrim
bi tiliyên şevê
çavdêrên vî bajarî
dikim xewê
û bedena riya kadizê
li pêş xewnên buharî
dûz dikim..
Belê.. .
di vê kêlîkê de
ez bûm
şivana keriyê xewnan.

# Ji Erşîfê Rojnemaya Kurdî


کرد
تعاون وترقی غزته سی

((Rojnama Te`awun û Tereqî Kurd))


**Di** hejamara yekê de ji ``Rojnema Kurdî Te`awun We Tereqqî`` - li 11ê meha Zîl Qe'dê sala 1326an Hicrî, yanê 5ê Kanûnê sala 1908an, di rûpela 7an de. Bedî`ûzzeman Mela seîdê Kurdî - Nûrsî - gotarek wî bi zimanê Kurdî tê de hatiye weşandin, emê ji xwendevanên hêja re ji tîpên Osmanî veguhêzin tîpên Latînî:

((Ey Gelê Kurdan, di Îttfaqê de qewet, di îtthadê de heyat, di biratiyê de se`adet, di hikûmetê de selamet heye. Kabikê îtthadê û şerî`ata muhebetê qewî bigrin, da we ji belayê xelas ke. Qenc guhê xwe bidinê, ezê tiştekî ji we re bibêjim. Hûn bizanin ku sê cewherê me hene; Yek îslamiyet e, ku hezar hezar xwîna şehîdan bihayê wê dane. Ê diduwan însaniyet e, ku lazime em xwe di nezera xelqê de bi xizmeta eqlî, ciwanmêranî û însaniyetî xwe nîşan bidin. Ê sisiyan milliyeta (qewmiyet) me ye ku mezîyetê (cudawazî) daye me, yên berî me ku bi qenciyê xwe sax in. Em bi karê xwe, bi hifza milliyeta xwe, ruhê wan di qebra wan de şad bikin. Piştî wê, sê dijminê me hene, me xerab dikin: Yek jê feqîrtî ye. Çil hezar ĥemalên Stenbolê delîlê wê ne. Ê diduyan cehaletî û bêxwendinî ye, ku hezar ji me nikarin yek qazete bixwînin, ew delîlê wê ye. Ê sisiyan dijminî û îxtilaf e, ku ev `edawet (dijmantî) qewata me winda dike û me jî mustehqê terbiye dike û hikûmet jî ji ……….

10

Tendurstî

# Pêdadana Maran! ….. Tedbîrên Pêşîn




♦ **Bijîşkê Newrozê**

**S**ala îsal, buhareke xweş li welêt hebû, di nav çawîrçîmanê de û di heyama buhara hêgin de, jîndarên çolê mîna: Mar, dûpişk… pir hêgin dibin. Lewre gerek e gundiyên me û hemî mirovên ku li çolê kar dikin, haya xwe ji wan nawiran bibin. Ji ber ku gelek ji wan, mîna maran, pêdadana wan zor xedar e, û carina mirov pê dikeve deraqê mirinê jî.

Li gora ku zanyar dibêjin, % 80 ji cureyên maran bê jehr in. Ango pêdadana wan ziyanê nagihîne govdê mirov, ji yên jehrdar jî, ji 20 ta %30, geza wan jehrkirinê çênake, tenê eyarê mirov birîn dike.

Gelek caran, jehrdarî û nejehrdariya geza maran di birînê re tê naskirin, gava cihê diranekî tenê li cihê gezê hebe, bi gelemperî ew mara nejehrdar e, ango mirov an jî dewar (mî, bizin…) jehrikî nabin.

Yek din jî heye gerek e mirov zani be, ne herdem geza mar bi êş û şewat e, carina êşa wî pir sivik e, yan jî hîç tuneye, lewre gerek e mera wê jî ji bîr neke. Lê belê bi tevahî, eger mar jehrdar be, êş zû dest pê dike, werm û perçafa eyêr jî piştî deh deqan dest pê dikin.

Gava mar bi mirovekî dade, gerek e ew bi xwe yan jî yên li derdora wî çi bikin:

1- Gustîlik, Si'et, bazing û cilên teng jê bikin.

2- Di jorî gezê re bi 15-20sm-an, were girêdan, ta rê li ber jehrê were birîn û cihê gezê jî bi dirêjbûna 6mm-an û bi kûrbûna 3mm-an were birînkirin û cihê birînê were mêtin.

Piştî wê, karê rast ew e, ku merovê pê hatî dadan bi lez bigihê nexwaşxanê da ku sîroma li dijî jehrê bibe û di bin çavdêriya bijîşkan de were dermankirin.

---

**Rastiya Xebata … Dûmahîk**

û di pişt re yê Desteya Bilind, ta ku herdu jî têk birin û herweha Lêvegera Siyasî jî. ***Ma gelo kî li pişt wê têkbirinê bû, ew li heza kê hat û xizmeta berjewendiyên kê kir***???

Ta roja îro jî, hin partiyên Kurdî di bin sîwana Hemahengiya Sûrî de cî girtine, û ew yek ji sedemên nelihevkirina tevgera rêzanî ya Kurdî li Sûriyê ye. Em ji wan jî dipirsin: ***Ma gelo bersivdayîna pirsên jorîn li cem kê ye??***

Dîroka gelê Kurd, û ya tevgera wê ya rêzanî ji her kesekî ve nas e, tucarî şerê tu gel, pêkhate û olan nekiriye. Di dîroka gelê Kurd a nûjen de, Kurdan bi dehan şoreş û serhildan li hember dagîrkerên Kurdistanê vêxistin, lê tucarî kiryarên terorîst û hovane ne di pirogramên wan de hebûn, û ne jî ji sinca Kurdan e, ku dijîtiya mirovan bikin.

Tevlî ev pirsên ku me nîşan dane û hewcedarî ji bersivdayênê re heye, dîsa em dibêjin Kurd ji bo Sûriyeke demokrat ku mafê hemû pêkhateyên wê di destûreke nû de parastî bin dixebitin. Bêguman rêjîma xwînrij ya ku dijîtiya hemû pêkhateyên Sûrî dike dê birûxe. Û tucarî gelê Kurd napejirîne ku tundrewên mejîtarî û li ser serê wan Da`iş û Cebhit El Nusra bibin destlatên Sûriyê, û ta Kurdek hebe emê herêmên xwe ji wan hovan biparêzin.

**Ji Erşîfê … Dûmahîk**

bêînsafiya[bêdad] xwe zilum li me dikir. Ku we ew seh kir, bizanin çara me ew e, ku em sê şûrên elmas bi destê xwe bigrin, ta ku em her sê cewherên xwe ji destê xwe nekin, her sê dijminê xwe ji ser xwe rakin. -Şûrê ewil me`arîf[zanîn] û xwendin e. -Yê diduyan îttifaq û muhebbeta millî ye. - Yê sisiyan, însanî, yê bi nefsa xwe şuxlê xwe bike. Û mîna sêfîlan ji qudreta xelqê hêvî neke û pişta xwe nedê. Wesiyeta paşî: Xwendin, xwendin, xwendin û dest hev girtin, dest hev girtin, dest hev girtin))..***Veguhastin ji tîpên Osmanî, Parêzer: Edhem Şêxo- Stembûl.***

**Ne ji ... Dûmahîk**

bijî- rizgar bikin . Wê lomê her-tim xem û qisaweta wan li cihekî yan kesekî ku xwe pê hilpesêrin digerîn.

2- Lawazbûna hişweriya rêzanî û zanyarî li ba gelek serkirdeyên me Kurdan, û kadroyên pêşeng, û berzbûna ezîtiya kesane û hikariya wê li ser nifîsên di dû wan re hatine jî .

3- Bandora Îdolociya felsefa Lênînî û Markisî û diyarbûna her du poleyên cîhanî û şerê sar di nav herdiwan de, li ser ramana siyasetmedarên Kurd -ên wê hîngê - roleke neyênî di yekrêziya Kurd de lîst .

4- Rola kirêt a saziyên ewlehî yên rijîma Sûriyê û bi taybetî yên rijîma "El-Be`is" di riya hevgihana wan bi hin serkirde û kadroyên pêşeng re di nav partiyên Kurd de, da ku yekrêziya Kurdan neçe serî û yê heye jî cardin perçe bike .

5- Hewildanên hin aliyên Kurdistanî ku tevgera Kurdî li Sûriyê bi xwe ve girê bide. Tiştê ku ciyê mixabinî û nerazîbûnê ye, ew nakokiyên wan bi wan partiyên kurdistanî bi hev re - di siya tunebûna kesayetiya Rojavayê Kurdistanê re- zirar gihand û ta niha jî dighîne yekrêziya kurdên Sûriyê.



Rast e hinek sedem ji wan sedemên, ku me anîne zimên niha bandora wan nemaye yan jî kêm bûye, lê em dikarin bêjin jî, ku bandora hin sedeman her çûye li me pir bûye.

Îro roj, pêdiviya Kurdên Rojavayê Kurdistanê(R.K) pir bi şiyarbûn û yekrêziyê heye. Yekrêziya me Kurdên "R.K" û avakirina kesayetiyeke serbixwe, dergeha dermankirinê ye û bersivdana hemî pirsên me ye.

**Talan ... Dûmahîk**

Kurd, Ereb û gelek pêkhateyên din li deverên Bakurê Sûryê bi hev re û di nava hev de dijîn. Wan hemiyan, li dirêjiya wan salan û berî wê jî, jiyana xwe bi hev re ava kirine. Civakên wan ji gelek aliyan de bi hev ve hatine girêdan. Tu pirsgirêkên balkêş di navbera wan de ranebûne. Ew hemî, û ta niha jî, bi hev re mîna biran dijîn û ji ber xaka xwe de bi terora reş re şer dikin jî. Pêşeroja wan yek bû, û îro û paşeroja wan jî wê bi pêwendiyên baş bi hev ve bêne girêdan.

Ji destpêka qeyrana Sûryê de û ta niha, bi sed hezaran Erebên ji hemî navçe û parêzgehên Sûryê li herêmên kurdî bicih bûne û lê dijîn. Bila kesek ji wan bêje ku Erebek toşî pirsgirêkeke netewî bi kurdekî re bûye. Gelê Kurd di dîroka xwe ya dirêj de, kîn, zikreşî, goçkirina xelkê, talankirin, nijadperestî û enfalkirina kesekî ne kiriye û ji binî de wê çanda çepel qebûl nake. Loma jî, ew û siyasetmedarên xwe jî, tucarî destê xwe navêjin warên cîranên xwe û qirêjiya nijadperestiyê bi ser serê xwe de nake û xwe li ber raya giştî ya cîhanî riswa û erzan jî nake.

Sed (qal û qîlên) virek û pilokxwaz[fitnecî] ji hêla kesên ku li ser sifra (Osmaniyên nû) dan dibin, nikanin biratiya Kurd û Ereban têk bibin, ne tenê li herêmên kurdî li Bakurê Sûryê, û li Sûryî bi tevahî, lê belê li seranserî Rojhilata Navîn. Rastî li ser zemînê ye, û bi vir û tewatîrên xêrnexwazan nayên berevajîkirin. Eger kî bawer nake, bila kerem bike were bi çavê serê xwe bibîne!.*

**Seyda ... Dûmahîk**

û dûrewarî bajarê Bordorê bibe û paşê jî li sala 1926an birin bajarê Parla. Ew heşt salan li wir ma û ``Nameyên El Nûr`` yên ku pê navdartir bû li wir nivîsandin.

M. Se`îşdê Newrsî li sala 1960î li bajarê Urfê çû ser qedera xwe. Lê piştî inqîlaba 1960î li Tirkiyê, termê wî ji gorê derxistin, birin li cihek nenas veşatin û gora wî jî kavil kirin, û ta niha jî gora wî nenase.

Dirûşma Se`îdê Nûrsî di warê siyasetê de jî ev bû: (( E`ûzû billah ji Şeytên û ji siyasetê)).

Mihemed Se`îdê Newresî ne tenê li Tirkiyê û Kurdistanê naskirî ye, ew li seranserî Rojhilata Navîn navdar e û bi Îmamê mezin, mewlayê olî û mirovê mislim ê rast û wêrek navdar bûye û ji mislimanan û ji gelê Kurd re jî bûye ciyê serbilindîyê.*

# Seyda Mihemed Se`îdê Nûrsî kî ye?

▪ Rozad Elî



Mihemed Se`îdê Nûrsî bi navê ((Bedî` El Zeman)) tê nasîn. Ew zanayekî olî yî Kurd e. Li sala 1877an li gundê ((Nûrsê yan Newresê)) ji herêma Wanê li Bakurê Kurdistanê ji dayîk bûye. Loma wî paşnavê xwe ``Nûrsî-Newresî`` ji gundê xwe biriye. Bavê wî: Mîrzayê Eliyê Xidir e ji hoza ``Esparîtê`` ye. Diya wî jî: Nûriya Mile Tahir ji gundê Bilikan ji hoza Xakêfê bû. Ew her du hoz jî ji hozên herêma Wanê ne.

Se`îdê Newrsî li 1888an li ber destê Şêx Seyêd Nûr Mihemedê Neqişbendî xwend û zanîna olî wergirt. Se`îdê Nûrsî di nava hevalên xwe de bi hişdariya xwe hati bû naskirin. Ew xortekî pir hişmend bû. Bi dehan pirtûkên Erebî yên ji gelek babetan li ezber kiri bû. Jixwe wî Quraana Pîroz jî li ezber kiri bû û şiroveya wê jî bi zanebûneke kûr û bi bawerî têdigihîşt.

Bedî`êzeman ji oldarên sofîtiyê dihat jimartin. Lê wî her tiştek bi zanîn û bawerî dibir, ne wek jê re dihat gotin.

Li sala 1896an xwe rakir û çû Stembûlê. Ramana avakirina zanîngehek mîna zanîngeha ((El Ezher)) li Misirê di serê wî de bû. Wî dixwast zanîngeheke bi navê ((El Zehra)) li Rojhilata Anadolê veke. Lê Silatan Ebdilhemîd daxwaza wî qebûl nekir û herwiha ew destvala vegerî Kurdistanê.

Li sala 1907an ji bo avakirina zanîngehekê dîsa berê xwe da Stembûlê ba Siltan Ebdilhemîd, lê Siltên ew baş pêşwazî ne kir û dîsa daxawaza wî red kir. Lewre wî helwestek û gotinên hişk li ser destlatê û siltên jî gotin. Wê hîngê komîta bijîşkên siltên biryar dan û gotin ku Nûrsî dîn bûye û herwiha ew avêtin nexwaşxana dînan. Lê gava ku bijîşk hat ew ezmûn kir, û hişdariya wî dît, got: Eger tenak dînîtî di Nûrsî de hebe tê wê wateyê ku hemî xelk dînin. Piştre ew ji nexwaşxanê derxistin û ji bo baweriyên wî yên siyasî û helwesta wî ji siltên, ew dane dadgeha leşkerî.

Li dema siltan Mihemed Reşad 1911ê, ew derbas nava rêxistinên taybet bû, ku wê hîngê ji bo parastina Xilafeta Îslamî hati bûn damezrandin. Loma jî ew di şerê cihanî yê yekê de di eniya şerê Rûsan de birîndar bû û dora du salan wek dîl li ba wan ma. Lê ew li dema şoreşa Bolşefî ji destê wan revî û vegerî welatê xwe.

Li sala 1918an Newresî wek endamekî di Mala Hikmê ya Îslamî de li Stembûlê hate binavkirin. Û piştî ku Stembûl hate dagîrkirin, ew ji ber pirtûka xwe ((Şeş Gav)) ji hêla hakimê Stembûlê yê Îngilîzî de bi dardekirinê hat sezakirin.

Piştî gotina wî ya tûj di Encûmena Gel de li Anqerê li derheqê sîstema kemalîstê ya nû û hilanîna Xilafeta Îslamî li Tirkiyê, Mistefaf Kemal xwest wî razî bike û jê xelas bibe jî, loma ew wek ((Amojkarê Giştî li Wîlayetên Rojhilatî)) hat binavkirin û mehaneyeke mezin jî jê re girêda, lê Newrsî ew yek nepejirand.

Li sala 1923an li Wanê vegerî û li wir di xerabekî de li çiyayê ``Arla`` rûnişt û perestvaniya xwe kir. Li wê demê, ji ber sedemên nediyar, ew razî ne bû ku di serhildana Şêx Se`îdê Pîran de beşdar bibe. Lê wî dewleta Mistefa Kemala ya nû jî nepejirand. Loma jî M.Kemal biryar da ku ew were binçavkirin ........ ⓫